سوريون من أجل الحقيقة والعدالة
Syrians For Truth & Justice

Nîsanê 2018



# Hêzên asayişê ên girêdayî rêveberiya xweser ve sekretêrê partîya Wekheviyê a demukrata Kurd "Ni'met Dawûd" binçav dikin,

Binçavkirina Dawûd roja 13ê Nîsanê 2018an li Qamişlo, piştî çend rojan ji binçavkirina Hevrêzkarê giştî ê tevgera çaksaziyê a Kurd "Fêsel Yûsiv" ve hate encam dan

## Derbarê rêxistina Sûriyên ji bo rastbînî û dadmendiyê

Sûriyên ji bo rastbînî û dadmendiyê rêxistineke Sûrî ye, serbixwe, nedesthilatdar, û ne fêdekar e, endamên wê Sûrî ne, ku tev ciherengbûna raman, bawerî û pêkhateyên wan, berevaniyê di ber mafên mirov de dikin, herwiha di nav tîmê damezirêner ê rêxistinê de, kesne akadîmîsyen ji welatne dîtir ve jî hene.

Herwiha rêxistin ji bo Sûriyeke azad û demukrat kar dike, ku tevahiya hemwelatiyên wê ji herdû zayindan di siya dadmendiyê, û wekheviya mafên mirov de, bi rûmet bijîn.

## Hêzên asayişê ên girêdayî rêveberiya xweser ve sekretêrê partîya Wekheviyê a demukrata Kurd "Ni'met Dawûd" binçav dikin

*Binçavkirina Dawûd roja 13ê Nîsanê 2018an li Qamişlo, piştî çend rojan ji binçavkirina Hevrêzkarê giştî ê tevgera çaksaziyê a Kurd "Fêsel Yûsiv" ve hate encam dan*

## Destpêk

Di êvara roja Înê 13ê nîsanê 2018an de, hêzên ewlekariyê ên girêdayî asayişa rêveberiya xweser ve, sekretêrê partîya Wekheviyê a demukrata Kurd "Ni'met Dawûd", ê ku di heman demê de endamê desteya serokatiyê a encumena niştîmanî a Kurd li Sûriyê ye, a ku beşeke ji itîlafa niştîmanî a hêzên şoreş û dijberiya Sûriyê, ji mala wî li Qamişlo "parêzgeha Hesekê" a ku li jêr desthilata rêveberiya xweser e binçav kirin.

Ni'met Dawûd, siyasetmedareke ji kurdên Sûriyê ye, ku li gundê "Girkê Deqoriya" ê bi ser bajarê Amûdê ve li parêzgeha Hesekê jidayik bûye, û belgenameya bîrkariyê ji zankoya Helebê hildigre, herwiha bavê du lawan û du keçan e.

Jiyana Dawûd a syasî ji sala 1970 ve, bi tevlîbûna wî bo partîya demukrata Kurd li Sûriyê dest pê bû, a ku navê wê bi duvre di kongirê partîyê ê çaran sala 1977 de bû partîya demukrata pêşverû a Kurd li Sûriyê.

Di sala 1983an de Dawûd bû endamê komîta herêmî di partîya xwe de, û di sala 1986an de bo komîta navendî hate hilbijartin, û di piştre bi perçebûna partîyê re di sala 1992an de "Ni'met Dawûd" bi şepêla siyasetmedar "Ezîz Dawûd" re çû, ku wê hingê navê partîyê wek xwe ma "partîya demukrata pêşverû a Kurd li Sûriyê", hêjayî gotinê yî ku "Ezîz Dawûd" sekretêrê wê partîyê bû, û "Ni'met Dawûd" endamê komîta navendî bû.

Şepêla "Ezîz Dawûd" di kongirê partîyê yê 9an sala 2008an de navê xwe guhert, ku navê wê bû "partîya wekheviyê a demukrata Kurd li Sûriyê".

Di kongirê partîyê yê 11an sala 2013an de "Ni'met Dawûd" wekî sekretêrê partîya Wekheviyê a demukrata Kurd li Sûriyê hate hilbijartin, û di piştre bûye endamê desteya serokatiya di encumena niştîmanî a Kurd li Sûriyê de, a ku di 26ê cotmehê de ji sala 2011an ve hatiye damezirandin.

## Hûrgiliyên binçavkirinê

Li gor malbata siyasetmedarê Kurd "Ni'met Dawûd" ku binçavkirina wî bi awayekî zordar hate encam dan. Endameke malbata Dawûd di vê derbarê de ji "Sûriyên ji bo rastbînî û dadmendiyê" re got:

"**Derdora demjimêr şeş û nîvê êvarê ji roja Înê 13ê Nîsanê 2018an, deriyê mala me bi xurtî hate lêdan, û Ni'met bi xwe derî vekir, û bi vekirina derî re dît ku bêhtirî deh çekdaran berê tifingên xwe nîşanê wî kirine, vêca wî ji wan pirsî: hûn kî ne?, wan jî bersiv da ku ew ji ewlekariya giştî ne, û bi ferman hatine ku wî binçav bikin, û bi lez çavên wî girtin, û wî birin cihekî nediyar**."

Ji aliyê xwe ve endamê komîta navendî a partîya Wekheviyê a demukrata Kurd li Sûriyê, Idrîs Xelo, ji Sûriyên ji bo rastbînî û dadmendiyê re got, ku sedema binçavkirina sekretêrê partîya wan û cihê ku asayişê wî birinê hîn diyar nebûye.

Herwiha li gor jêderne berpirs bo "Sûriyên ji bo rastbînî û dadmendiyê", ku binçavkirina Dawûd û berî wî hevrêzkarê giştî ê tevgera çaksaziyê a Kurd li Sûriyê "Fêsel Yûsiv" hat ji piştî tawanên xiniztiyê "xiyanetê" ên ku encumena cîbicîkar di rêveberiya xweser de, ji piştî şerên Efrînê, da ser endamên partiya "Yekîtî" û serkirdeyên encumena niştîmanî a Kurd, û daxwaz kir "encumena cîbicîkar" ku kesên xerabkar "li gor binavkirina wê" di ENKSê de bêne darizandin "dadgeh kirin", û encumena niştîmanî jî helwesta xwe ji kontrolkirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirkiyê û hêzên "Artêşa azad a Sûriyê" ve zelal bike.

Hêjayî gotinê yî ku "Sûriyên ji bo rastbînî û dadmendiyê" berî çendakî bi sernavê "Bangewazî bo serbestberdana hevrêzkarê giştî ê tevgera çaksaziyê a Kurd, Fêsel Yûsiv. Binçavkirina Yûsiv roja duşemê 2ê nîsanê 2018an, bi destê hêzên asayişê ên girêdayî rêveberiya xweser ve hate encam dan" raporek amade kiribû.

## Şermezarkirin û nerazîbûnê derbarê binçavkirina "Ni'met Dawûd" de


Di barê binçavkirina Dawûd de, emîndariya giştî a encumena niştîmanî a Kurd li Sûriyê, di gotareke xwe de, roja şemîyê 14ê nîsanê 2018an got, ku binçavkirina "Ni'met Dawûd" hewldaneke têkçûyî ye ji aliyê partîya yekîtiya demukrat PYD ve, ku dixwaze bi hêza çekan xwe ferz bike, her ji bo astengkirina xebata encumenê û têkbirina pirojeya wê a netewî, nemaze ji piştî têkçûyîna PYDê di Efrînê de, li gor ku di gotarê de hatiye.

Gotara ENKSê ji PYDê xwest ku "Ni'met Dawûd, Fêsel Yûsiv, Ebdilrehman Apo, û Fûad Ibrahîm" herwiha tevahiya girtiyên nerînê ên ku din ku di girtîgehên wê de ne, bilez serbest berde.

Ji aliyê xwe ve, nivîsgeha ragihandinê a partîya Wekhevîyê a demukrata Kurd li Sûriyê, di gotarekê de roja Înê 13ê Nîsanê 2018an got, ku kiryarên bêhawe ên partîya yekîtiya demukrat PYD dermafê endam û serkirdeyên encumena niştîmanî a Kurd tenê dikevin xizmeta dijminên gelê Kurd û kêşeya Kurdan a dadmend.

Gotara navbuhurî kiryarên partîya yekîtiya demukrat bi tundî şermezar kir, û weke karên bêberpirsyartî binav kir, û her ji PYDê daxwaz kir ku bi awayekî lezok "Ni'met Dawûd" û tevahiya girtiyên nerînê ên ku di girtîgehên wê de ne serbest berde, û vegere maseya hevpeyvînê.

Gotara nivîsgeha ragihandinê a partîya Wekheviyê a demukrata Kurd li Sûriyê, daxwaz ji hêz û partîyên Kurdistanê, û rêxistinên mirovane kir, ku fişarê li partîya yekîtiya demukrat PYDê bikin da ku kiryarên ne rewa û zêdegaviyên bê sûde neke, weke ku di gotarê de hatiye.



حزب المساواة الديمقراطي الكردي
Yesterday at 12:23am ·

تصريح بخصوص اعتقال الأستاذ نعمت داوود سكرتير حزبنا ( حزب المساواة الديمقراطي الكردي في سوريا ) وعضو رئاسة المجلس الوطني الكردي

في ظل استمرار التصعيد ضد كوادر وقيادات المجلس الوطني الكردي من قبل سلطة PYD أقدمت مساء هذا اليوم الجمعة الواقع في 13/4/2018 مجموعة مسلحة تابعة لهذه السلطة على اقتحام منزل الرفيق نعمت داوود عضو هيئة رئاسة المجلس الوطني الكردي وسكرتير حزبنا حزب المساواة الديمقراطي الكردي في سورية واقتيد إلى جهة غير معلومة تأتي هذه التصرفات اللامسؤولة بعد كارثة عفرين نتيجة أعمالها الاستفزازية التي تذرعت بها تركيا وكانت السبب المباشر للقيام بعدوانها واحتلالها لمدينة عفرين وريفها . ومتذرعة بمساهمة المجلس مع العدوان التركي على احتلال مدينة عفرين وكأن المجلس وأحزابه هم من قادوا هذا العدوان المدان بكل أشكاله .
إن الاستمرار بهذه السلوكيات اللامسؤولة تجاه المجلس وكوادره لا تخدم سوى أعداء الكرد وقضيته القومية العادلة
ويستوجب من PYD مراجعة سياساتها والكف عن هذه الأعمال والعودة إلى طاولة الحوار الجاد خدمة لقضية شعبنا العادلة ونأمل من القوى والأحزاب الكردية والكردستانية والجهات والمنظمات الحقوقية إدانة هذه الاعتقالات بشدة و التدخل والضغط باتجاه وقف هذه الأعمال الاستفزازية الأعمال المنافية للقيم الديمقراطية التي تدعيها سلطة pyd والتي لا طائل منها واعتقال سراحه وكافة معتقلي المجلس الوطني الكردي فورا.

مكتب الإعلام في حزب المساواة الديمقراطي الكردي في سوريا
قامشلو في 13/4/2018

Di wêneyê de: gotara nivîsgeha ragihandinê a partîya Wekheviyê a demukrta Kurd li Sûriyê derbarê binçavkirina Ni'met Dawûd, di 13ê Nîsanê 2018an de, jêder: Nivîsgeha ragihandinê a partîya Wekhevîyê a demukrta Kurd li Sûriyê.

Di heman babetê de, navenda Edil "Dadmendî" a mafên mirov, di daxuyaniyeke xwe de, roja Înê 13ê Nîsanê 2018, binçavkirina "Ni'met Dawûd" ji aliyê hêzên asayişê ên girêdayî rêveberiya xweser ve, şermezar kir, û her li gor daxuyaniyê ku ev kiryar zêdegaviyê li mafên mirov dikin, û azadiyên ku di belge, peyman û yasayên navdewletî de hatine binpê dikin, herwiha alozî û pirsgirêkên di navbera aliyên siyasî ên Kurdî de gûrtir dikin, ên ku li gor rêkeftin û peymanên girêdayî bi aştiyê û mafên mirov ve pêdivêtin bi hevpeyvîneke rasterast û dûdirêj, di siya rewşeke tije azadî, demukrasî, ciherngî, û wekheviyê, li gel peydabûna rêzgirtinê ji mafan û azadiyên sereke ên mirovan re.

Herwiha di agahdariyeke xwe de, desteya serkirdayetiyê a partiya yekîtiya demukrat a Kurd li Sûriyê "El-wihdê", roja Înê 13ê Nîsanê 2018an kiryarên partiya yekîtiya demukrat PYDê di barê berdewambûna binçavkirina endam û serkirdeyên encumena niştîmanî a Kurd, û ji nav wan herdû endamên desteya serkirdayetiyê di ENKSê de "Ni'met Dawûd û Fêsel Yûsiv" şermezar kir.

Desteya Serkirdayetiyê a partîya yekîtî "El-wihdê" got, ku divê PYDê nemaze piştî bûyerên Efrînê, ji bo yekrêziya Kurdan kar bike, û bi gotina wê ku ev yek di serê hêvî û daxwazên gelê Kurd de ye, û bi awayekî berdewam banga vê yekê dibe.

Li aliyekî din ve, rêxistina asûrî a demukrat, di gotareke xwe de, roja şemiyê 14ê Nîsanê 2018an, berpirsayetî di barê tenderûstî û saxlemiya "Ni'met Dawûd" kir stuwê partiya yekîtiya demukrat, û daxwaz jê kir ku bi awayekî lezok "Dawûd û Fêsel Yûsiv" û tevahiya girtiyên nerînê ên ku di girtîgehên wê de ne serbest berde.


ADO News / آدو الإخباري
Yesterday at 3:21pm ·

تصريح حول اعتقال الأستاذ نعمت داوود سكرتير حزب المساواة الديمقراطي الكردي في سوريا
Ado news
أقدمت مساء أمس الجمعة 13 نيسان 2018، دورية مسلحة من الأسايش التابعة للإدارة الذاتية والتي تحظى بغطاء سياسي من حزب الاتحاد الديمقراطي PYD، على مداهمة منزل الأستاذ نعمت داوود عضو هيئة رئاسة المجلس الوطني الكردي، وسكرتير حزب المساواة الديمقراطي الكردي في سورية واقتاده إلى جهة مجهولة.
يؤكد هذا السلوك استمرار سلطة الأمر الواقع التي يهيمن عليها حزب الاتحاد الديمقراطي PYD في ممارساتها القمعية ضد كوادر وقيادات المجلس الوطني الكردي، وإمعانا في التضييق على حرية الرأي والعمل السياسي، مما يزيد من حدة الاحتقان ويعمق الشعور بالغبن لدى شرائح واسعة في المجتمع ويهدد مستقبل السلم والأمن الاجتماعي.
إننا في المنظمة الآثورية الديمقراطية إذ ندين اعتقال الأستاذ نعمت داوود ونحمل سلطة الأمر الواقع كامل المسؤولية القانونية عن أي أذى قد يتعرض له، فإننا في ذات الوقت نجدد دعوتنا لحزب الاتحاد الديمقراطي ومنظومة المجتمع الديمقراطي بإعادة النظر بهذه السلوكيات المتنافية مع قيم الديمقراطية وحقوق الإنسان، والقبول بمنطق وأدوات الصراع السياسي، وإطلاق سراح كوادر وقيادات المجلس الوطني الكردي وجميع معتقلي الرأي، وإغلاق ملف الاعتقال السياسي، كخطوة أولية تمهيدا للنهوض بحوار مسؤول وواسع وغير مشروط يرقى لمستوى التحديات التي تواجهها البلاد، للتوصل إلى توافقات وطنية تستند بقناعتنا، إلى الكثير من التقاطعات في مستوى الرؤية والحقوق والإدارة، وقادرة على تقديم جرعة كافية من الأمل بمستقبل أفضل للجميع.
الحرية للأستاذين نعمت داوود و فيصل يوسف، ولجميع معتقلي الراي.
عاشت سوريا وطنا حرا لكل أبنائها.
سوريا في 14 نيسان 2018
المنظمة الآثورية الديمقراطية
المكتب السياسي

Di wêneyê de, gotara rêxistina asûrî a demukrat, di 14 Nîsanê 2018an de, derbarê binçavkirina "Ni'met Dawûd", jêder: rêxistina asûrî a demukrat.

Hêjayî gotinê yî, ku hêzên asayişê ên girêdayî rêveberiya xweser ve, berbanga roja duşemê 2ê Nîsanê 2018an, endamê desteya serokatiyê di encumena niştîmanî a Kurd de, û hevrêzkarê giştî ê tevgera çaksaziyê a Kurd li Sûriyê "Fêsel Yûsiv" binçav kiribûn, ê ku sedemên girtina wî ta niha jî nediyarin.

Tê zanîn ku hêzên asayişê ên girêdayî rêveberiya xweser ve, di roja sêşemê 13ê sibata çûyî ve, çar girtiyên encumena niştîmanî a Kurd li Qamişlo "bakurê rojhilatê Sûriyê", serbest berdan, ku ji nav wan rojnamevan "Alan Selîm Ehmed" nûçegîhanê malpera Yekîtî Mîdya a bi ser partiya yekîtî a Kurd li Sûriyê ve, û her yek ji Salih Cemîl, Cinêd Seyd Mecîd, û Deham Remezan Hesen, endamên partiya demukrata Kurdistanê li Sûriyê, ji piştî ku "Alan Selîm Ehmed" bêhtir ji salekê û nîvê di zindanên rêveberiya xweser de girtî mabû.